Peymangeha Navnetewî ya Şano ITI

Rêxistina Cîhanî ya hunerên şanoyê

Nameya Roja Cîhanî Ya Şanoya Giştî 2020

Zanyariyên kesayetî yên nivîserê nameyê: Şehîd Nedîm ,Pakistan

Çapa KURDÎ

Şehîd Nedîm

Nivîskarê Şano

Şehîd Nedîm nivîskarekî şanoyî paye bilind e li Pakistan herweha ew serokê Şanoya Ajoka ya .navdar e

Şehîd Nedîm di sala 1947an de li Soboro, Keşmîr ji dayik bûye. Hîn di temenekî biçûk de dema ew yeksalî bû penaber bûye, çaxê malbata wî neçarbû da kocî Pakistan bikê ya ku wê demê ji nûve ava dibû, piştî şerê sala 1948an dinavbera Hind û Pakistanê li ser herêma Keşmîr ya nakokî li ser berdewam in. Ew li Lahora Pakistan dijî û li wir macistêr di zanîsta derûnî de ji zankoya Pencab wergirt. Wî şanoya xwe î yekem wek şagirtekî zankoyê nivîsî lê dema ku wî dest bi alîkariya koma Şanoya parçebûyî li Pakistan kir, Ajoka, ya ku Medîha Cewher avakir ewjî çalekvanek e şano bû ku paşê bûye hevjîna wî, wê hingê taybetmendiya .wî ya nivîskariyê tekez bû

Şehîd Nedîm bihtir ji 50 şanoyên resen bi herdû zimanên Pencabî û Ordo nivîsand in û gelek .serrastkirin li ser şanoyên Birîxt jî

Ew li telefizyona Pakistanê, wek berhemdar û endam bi kargêriya bala ve girêdayî bû. Herweha ji ber dijatiya wî ji desthilatdariya leşkerî re ew sê caran ketiye zindan ên cuda yên ku leşker desthilatdariya wan dikirin , û Rêxistina Lêborîna Navnetewî ew wek girtiyê ramanê binav kir. Li zindana Miyanwalî ya ku navê wê bi nebaşî belav bûye wî dest bi nivîsandina .şanoyên Dawiya Înê kir yên zindaniya bi xwe berhemdar û sponserê wan bûn

Piştre ew wek rêkxiraw di kampanyên navnetewî de û berpirsê peywendariyê li devera Asya û Oqyanosya Aram li ba Rêxistina Lêborîna Navnetewî bû. Herweha ew Heval bû li gel (Peymangeha Gêtî Rîsêrç) û ( Întirnaşînal pên ) û USA û Naşînal Endomênt ji bo Demokrasiyê, .Herweha ew endamê Şanoya Bê Sînor bû

Şanoyên Şehîd Nedîm li ser astek berfereh li Pakistan û Hindê hatin pêşkêşkir in. Herweha li seranserî cîhanê jî hatin pêşkêşkir in ji wan Bulha ku li Şanoya Hamersmîs (London UK), Tramwêy (Gilasko Skotlanda,UK) û Hêlsîgnor (Denîmark), Amrîka Çêllo li navenda ( Davîs) ya bikaranîna Hunerê, Zankoya Corctawin, Waşînton (USA) , Bala Kîng li ser Şanoya Blak Boks (Oslo Nêrwîc), Borkavacanza li USA li Biravo ya Jinan (San Firansîsko), Akyûtwal li Haywêyz(Santa Monîka), û Şanoya Row (New York), û Dara li Şanoya Laytlîton London (UK), û . (Zankoya Nors Karolîna, Çapil Hîl (USA

Şanoyên wî bo zimanê Îngilîzî hatin wergerandin û çapxaneya Zankoya Okisfordê ew belav kirin, herweha çapemeniya belavkirinê Nayk Hîron û li nav gelek hilbijardeyan de jî belav bûn. Wî nîşana serokê Pakistan ya şahnaziya pêkanînê di sala 2009an de wergirt. Herweha wî derhîneriya gelek şanoyan ji bo telefizyon û şanoyê jî kir, herweha wî kernevalên şanoya aştiyê li Hind û Pakistanê birêve bir in. Wî hemahengî di rêveberiya rojnameyên Pakistanî û Hindî de kir, û xizmeta BBC ya Ordî jî dikir,  wî gelk fîlmên dîkomêntêr di warê çandî de berhem dan ji wan berhem an Mozexaneya Lahor û torreyên Pencaban, helbestvan Îqbal û .wênesaz Sadiqîn

Şanoyên Şehîd Nedîm li herderî cihê rêzgirtineke mezin in, ji ber ku babet in wêrek in û girêdayî civakê ne, carna jî ew nêzîkî tiştin qedexe jî dibe we tundrewiya olî û zordariya li dijî .jinê û zoriya li ser kêmnetewan û azadiya raman, seqa, aştî û sofîtiyê

Piraniya sernavên şanoyên wî li ser parçekirina başûrê Asya û li ser hevbeşiya çand û kultûra deverê diaxiv in. Ew pir bi zanebûn girêdanê di navbera mijarên siyasî û civakî yên nûjen de dikê, herweha şêweyên normal û kultûra gelerî ji bo pêşkêşkirina şanoyek e xweş da bikarî .hiş biramîn e

Mozîk jî parçekî resen e di berhemên wî ên şanoyî de. Ew mamosteyê hunera şêwaza nivîsînê li peymangeha Ajoka ya hunerên şanoyî ye û hevdem peymangeha çand û Hunerê, li .Lahor

Werger ji zimanê Ingilîzî: Lawîn Şêxo

KOma Şano/ Qamişlo